

Lawaziya zimanê wergera kurmancî

Elî Paksirêşt

Çima zimanê piraniya – ne hemû - wergêrên kurmanciyê lawaz e?

Dema mirov qala wergêran dike bêguman hin taybetmendiyên wergêran hene ku wan ji axêverên asayî yên zimên cuda dikin. Em li vir qala wergêrên nivîskî dikin ne devkî.

1-Wergêr ew kes e ku ser her du zimanên çavkanî û armanc şareza ye,

2-Li gorî hin wergernasan wergêr divê bi qasî nivîskarê mijarê ser mijarê zana be,

3-Wergêr divê beriya ku berhemê wergerîne, carekê wê baş bixwîne û piştî biryara wergerandinê bide,

4-Wergêr divê - heya ku dibe - hemû devokên kurmanciyê nas bike û xwe kêmsînori devera xwe neke,

5-Wergêr divê zargotina/folklorê kurmanciyê bixwîne û guhdarî bike, çîrokên bav û kalan, stran, ... eger wê yekê neke nikare ruhê kurmanciyê baş bizane û wergera wî/wê jî yê bêruh be, ev xala pîrr girîng e,

6-Wergêr divê ji wergera peyv bi peyv bireve û mêhwera hevnişîniyê ya zimanê çavkaniyê nexwe nava zimanê armanc, divê hevdem ku emanetdar e, hevokan - heya ku dibe - wisan bike ku xwendevan wisan bifikire ku nivîs e, ne werger. Wek mînak, em di kurmanciyê da dema bo hezkirina jî zarokê/xizên dibêjin (berxê min, kara min, ...) eger wergêr vêya peyv bi peyv li farisiyê bike (بره من, ... بزغاله من, werger bêwate dibe û divê wekî (عزیزم, عزیز بابا/مامان, ...) wergerîne,

7-Wergêrê romanê divê bixwe bi qasî ku têr bike, romanên kurmanciyê xwendibe. Hevalekî ku bi salan e wergera inglîs-kurmancî ya nivîsên ne-wêjeyî dike, carekê di axaftineke telefonî da bi seyr/ecêb pirsî: Ma romanên kurmancî jî hene? Welleh, min nedizanî!

8-Wergêrê berhemên wêjeyî divê rêbaz û şewazên wergernasiyê jî bixwîne û teknîkên wergerê hîn bibe, wergera romanê û ya filmê yek nînin,

9-Wergêr divê di wergerê da rêbaz/stayl û asta zimanê nivîskêr raçav bike. Mirov nikare hevoka kuçe û kolanan, zimanê zarokan, zimanê bazariyan, ... giştî di asteke zimanî da wergerîne,

10-Wergêr divê li her dera ku nizane ji nivîskêr bipirse, pirsîn şerm nîne,

11-Wergêr divê wergera xwe bide kesekî/a din beriya weşanê seretast bike ku heribar be, şaşiyên ihtimalî çêbike, pêşniyaran bike, ...

12-Wergêrê ku xwe ji hêla zimên va xurt neke, ew ê derbeyên mezin li zimanê xwe bixe, wergêrê ku zimanê wî xurt be, ew ê xizmeteke mezin bo geşepêdana zimanê xwe bike, wek mînak wergerên ji zimanên ewrûpî li serdema Qeceran û Pehleviyan gellekî arîkarî da geşepêdana farisiya nûjen,

13-Wergêr divê ser mijara wergerê şareza be. Kesê/a ku bîrkarî/matematîkê nizane nikare bibe wergêr/a bîrkariyê, ...

14-Wergêr divê bend, sernav, xalbendî, rênivîs, rêziman, têbînî, font, hwd. raçav bike,

- 15- Wergêr divê pêdiviyên sereke yê xêvjimêrê/kompûtêrê wekî WORD, PDF, EXCELL, ... bizane,
- 16-Wergêr divê nivîsbar/normalavên navdar ên wergerê wekî TRADOSê nas bike û pê kar bike,
- 17-Wergêr divê nivîsarên govar û pirtûkên têkildarî wergerê bişopîne, wek mînak li Îranê çendîn kovar hene ku li bara wergernasiyê tî weşandin, wekî (مجله مترجم/مطالعات ترجمه، مترجم), ...
- 18-Wergêr divê ji wergera wergerê wernegerîne, meger ku êdî ti çare tunebe,
- 19-Wergêr divê rexneyên ser wergera xwe bixwîne û yê rast bipejirîne,
- 20-Wergêr divê bo bêjeyan heya ku dibe beramberan peyda bike, eger nebû, wek têbînî şirove bike, ji ber ku hin tişt têkildarî hin çandan in,